Sîstemê fedralî dê li seranserî Îraqê bibe rastî

Amadekirin: Ehmed Miho Hacî

Roj bi roj rewşa Îraqê pitir aloz dibe. Babetê dabeşbûna Îraqê jî ciyê xwe di nava wê aloziyê de digire û gelek caran bi germî dihê pêş jî. Ev babet ango pirojeya dabeşkirina Îraqê di navendên siyasî û li cem kesanên şareza de li rojava û hindek ji endamên kongirsa Emirîkayî bi germî dihê pêşwazîkirin ku ew weku çareseriyekê ji wê qeyrana Emirîka ketiye tê de li Îraqê dihêne ziman. Helbet vî babetî ciyê xwe li ba hindek aliyên îraqî jî kiriye ku belku ew jî bi mêjiyekî vekirî û bi awayekî waqî lê mêze dikin. Beriya pitir ji salekê sînatorê dîmokratî Cozêf Baydin Bîrokeya dabeşkirina Îraqê li ser sê herêmên ji hev cuda xiste rojevê ku her herêmek bi xwe hukmiraniya xwe bike. Ev herêm jî ev bûn: Herêma kurdî ku dikeve bakûrê Îraqê û pitiriya xelkê wê kurd in. Herêma sunî dikeve naverasta Îraqê û wan deveran bi xwe ve digire ewên rêjeya erebên sunî lê gelek û herêma sêyê jî herêma şîeyane ku deverên başûrê Bexdayê bi xwe ve digire ku rêjeya here mezina erebên şîe li wê deverê akincîne. Li wî demî her çend bû ew hizir çi bi awayekî rasterast çi bi awayekî nerasteûxwe li ba hindek aliyên îraqî ve pêşwazî lê hate kirin. Lê belê ji aliyê Koçka Ssipî ve û li ser zarê axavtkerê wê yê fermî Tonî Sino ve bi dijwarî hat retkirin û got: "me çu Belqanên nû nevên". Her dîsan pêşnyara Baydinî ji aliyê koma vekolîna Îraqê jî ya ku wezîrê derveyê Emirîkî yê berê Cîmis Bîker serokatiya wê dike nehat qebûlkirin. Vê komê wisa anî ziman ku "dabeşkirina Îraqê, hêleka sore, nabe bihê derbazkirin, çunku her guhorîneka ji wî awayî li Îraqê rû bide dê tev herêmê ber bi aloziyeka mezintir ve bibe û dê delîveyeka mezin ji îranê re peyda bike ku kontrolê li ser herêma şîey ya nû bike û her wesa dê bibe sedem ji bo êşandina Tirkiya ku ew jî ji avabûna dewleteka kurdî li başûrê xwe ditirse". Ji bilî kurdan weku di hindek kenalên ragehandinê de dihê diyarkirin, helwîstê aliyên din yên îraqî li hember bi cîkirina fediraliyê hind ron û aşikira nînin ku ji rexekî ve aliyên şîey hizir û boçûnên cuda li ser fediraliyê hene û sunî her di bineret de wî sistemî ret dikin û weku destpêkekê bo parçekirina Îraqê lê dinêrin û hindek wisa bo diçin ku destnîşankirina 17% ji dahatiyê nefta Îraqê bo hikumeta herêma Kurdistanê destpêkeka aşkiraye ji bo cîbicîkirina fediraliyê li Îraqê. Li ser vî babetî senterê Birokînciz yê vekolînên siyasî û stratîjî li Waşintonê wesa daye diyarkirin ku helwîstê kurdan ji her aliyekî din yê Îraqî rohintire û bi taybet hemû partiyên kurdî yek helwîst û dîtin li hember

serweriya herêma Kurdistana Îraqê hene û berdewamdanê bi wî sistemê hikumdariyê yê ku niho li herêmê dihê peyrewkirin û ev yek jî li gor senterê Birokînciz li gel helwîstê suniyan hevdije yên ku ji sistemê dabeşkirinê ditirsin û ew tirsa wan jî ji ber wê yekêye ku hizir dikin ev pilan dê kontrola şîeyan li ser dahatiyên petrolê mukim bike. Bi taybet pitiriya zeviyên neftê dikevine devera başûrî ew devera ku li bere bibe herêmeka şîe ya fediral heger hat û Îraq dabeş bû. Sebaret vê yekê şîe ta niho xwedî yek helwîst nebûne û hindek ji wan nerazîbûna xwe li hember wê pilanê diyar kirîne ya ku Ebdulezîz Elhekîm serokê civata bilinda îslamî li Îraqê kar bo dike ewa dibêje: "Gereke Îraq bihê dabeşkirin bo çend herêman û her herêmek bi xwe hikumdariya xwe bike". Û aliyê ji hemûyan aşkiratir dijayetiya xwe gelek caran diyar kirî, rewtê Sedirî bûye ku ne li gel damezrandina herêmeka şîeye li başûr. Sebaret suniyan û dîsan li gor vekolînên wî senterî, diyar dike ku sunî îro gehiştîne wê rastiyê ku ew nema dikarin êdî kontrolê li ser hemû Îraqê bikin weku wan di zemanê Sedamî de dikir. Pêdiviye ew li pey awayekî yan sistemekî din bigerin ku li gel rewşa siyasî û dîmografiya nû bigunce. Li gorey hindek çavkaniyên din, şerê neragehandiyê navxwe yê Îraqê îro bûye sedema duristbûna jîwarekî nû ku li pey hindek jimêryarên komîsyona bilind ya karûbarên penahendeyan ewa ser bi UN ê ve ku diyar dike ta kanûna duyê 2007-ê jimareya penahendeyên Îraqê li welatên dewrûber gehiştiye melyon kesan, lê jimareya wan di hundirê Îraqê bi xwe de gehiştî ye 1.7 milyon penahendeyan. Dîsan raportan wisa da xuyakirin ku her mehê pitir ji nîv melyon îraqiyan ji ser cih û warên wan dihên derxistin. Ji aliyekî din ve welatiyên îraqî bizavê dikin ku ber bi wan deveran ve mişext bibin yên ku heman corê wan yê etnî lê hey eve li gor gotinên rêkxirawa mişextbûna cîhanî ewa diyar kirî ku erebên şîeye ji naverasta Îraqê ber bi başûrî ve diçin û berûvajî wan suneyên ereb ji başûrî ber bi naverastê ve dihên û bi taybet bo parêzgeha Enbar. Ev diyardeya mişextbûna bi koma navxweyî, li gorey rêkxirawên navdewletî dê Îraqê ber bi Belqaneka nû ve bihajon. Li dawiyê dikarim bibêjim ku li gorey van hemû raport û jimartinan diyar dibe ku Îraq ber bi corekê dabeşbûnê ve diçe. Lê çi core dabeşbûneke hêj baş reng û sîmayên wê xuya nebûne lê her çawa be şêweyê fediraliyê îro ji hemû şêweyên din pitir cihgîre û pişteyanên xwe jî hene. Encam bi hizra min her çende fakterên parvekirina Îraqê pitir di ketwarî de. Lê hemû nekarîgerin mîna yek fakterê pêkvegirêdana Îraqê. Lewra ez dibînim Îraq dimîne di vê rewşê de, heta ku bi hizra derekî dihê givaştin û hemû hewildan ji bo mana Îraqê dişêne encamdan dê mîne parçekirina Îraqê dawîtirîn rêk ango heger hat û îraq ji destê hêzdariya derekî derket, mimkune bihê parvekirin, lê ev îhtimale zor ya kême.